Wan Bêdadegeh Dihêlin

Dîlan Ziving,

Di wa şevê de, xew nediket çavên min ! Hest û ramanên bivetî û tirsê ,xwe li min pêça bûn ku , bûyerek an jî … wê were serê bavê min , yê bi awakî ji me bi dûr keve , nemaze pêlên xemgîniyê ji çend rojan ve li ser rûyê wî baş diyar bûn . Lê zor mixabin , zarokekî mîna min biçûk , pênc mihekî ne dîl ne ziman da , ji min hilînin ku bûyereke nediyar , li van rojan , biser me de tê . Gelo , cima ew nikarin ji yên weke me rakin ? . Vêca jî , tenê min dikire qîr û girî, ji girî pê ve min nedikarî tuştek bikira . Hêvî û armanca min, ji ev reng girînê, ew bû ku , belikîm ew dê û bavên min yeka xwe ji min hilînin ? Pir û pir mixabin, wan bi xemgînî û şêtmayî li hevdu dixurcilîn û weha digotin : Bi xwedê ev zarok nesax e ! Pêwîste, em wî bibne ser bijîşkekî.. û her wisan jî, wan xwe ji bo wê ,xwe amide dikir. Hingê bavê min , bi dilovaniyeke bê hempa ez hembêz dikirim , bi rûkî berkenî strana kalo yak u , min pir jê hezdikim û pê kêfxweş dibûn , wî ji min re distire. bêdeng li çavên wî dimeyizand û dixwest jê re bigota : bavo! xoşewîstê dilê min , ez ne birçîme û ne jî nesaxim lê,li ser te bi tirsim ku , bêbexitya demê, destên me ji hevdu bike ! di wa destnavê de deng bi diya min diket û digot : ji bo çûna texitor em amide . Wa hinge, bavê min bersiva diya min weha dida û digot : vaye zarok hêdî û bêdeng bûye , sibe bê û xêr pêre , şev derang e û texitor …. Min careke dî dest bi girî û hawara xwe dikir, bi vê awî diwestiyam pîçikê xilmaş û bê hêz dibûm pêre ..pêre jî şifaqa sibê li me vedihat û min careke dî girî-şîn dikir. Wisan jî , wan bi lez ez dibirme texitor û li vegerê bavê min xatir ji me dixwet ku , ewê biçe ser karê xwe, wa hingê min bi hêrs dikire qîr û girî .Lewre jî, weke mirovekî sermest radiketim . Piştî çend katan, min çavên xwe vedikirin ku , ez li mala pîrika xwe raketîme û hemû xemgîn û melûl in. Diya min, bi serbilindî weha digot : ew ji bo rûmeta gelê kurd îro , ji me bi dûr ketiye . Lê min baş dizanî ku , diya min li ser çarenûsa bavo çiqas bi qisawet û melûl e herdem hêvî û armanca wê , ji wa roja xemgînê ve ku, min dixewêke û bi dost û hevlên bavo re, li ser rewşa wî baxife. .. Ez qet ranediketim û pêre ..pêre guftogoyên wan tevan dikir ku kesatiya bavo baş nasbikim .. Ew mirovekî birêz û xebatkar e, yekek ji serok û rêberên tevgera kurd e . Loman jî , îro neyar ji yên weke wî ditirsin û wan digrin, di binê hepis û zîndanên rêjîma sûriyê ya şoven û bêbexit de bê dadegeh wan dihêlin.

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de